



# Bernameya karê destan

KURMANJI

**Bernameya karê destan  
bernameyeka pişeyî ye û  
bidestxistina dîplomeya  
pişeyî armanca wê ye.**

Bernameya karê destan ji te re yê ku hez dike destên xwe bi kar bîne û pişeyeka kardestiyê ya behremend bike. Tu dikarî karê destan di gelek branşên cuda de bibijêrî.

Tu dikarî piştî qedandina xwendinê yekser kar bikî yan xwendina xwe li xwendîngeha bilind ya pişeyî berdewam bikî. Tu dikarî jî ji xwe re kursên zêde bixwînî da xwendina xwe li xwendîngeha bilind bidomînî.

## PÊNC PISPORIYÊN CUDA

### Xeratiya/necariya nazik

- Tu dê fêrî metodên çêkirinê bibî û zanyariyan li ser amûret, makîne û materyal û malzemeyan werbigirî. Ev pisporî îmkanê dide ku tu wek, bo nimûne, keleksaz, xeratê/necarê navmaliyê, xeratê mobîlyeyan yan jî di warê bazara alavên darîn û yên avahiyan de kar bikî.

### Gulfiroş

- Tu dê zanyariyan li ser gulên jêkirî (yên ciwankariyê), ka mirov çawa materyal û malzemeyên cuda ji bo afirandina gulkariyan têkel dike û li ser nebatên qafîkan werbigirî. Ev pisporî îmkanê dide ku tu wek, bo nimûne, gulfiroş kar bikî.

### Sertiraş/berber

- Tu dê fêrî rêkar û teknîkên cuda bibî û zanyariyan li ser amûret û materyal û malzemeyan werbigirî. Ev pisporî îmkanê dide ku tu wek, bo nimûne, alîkarê sertiraşî/berberî kar bikî.

### Tekstîlkarî

- Tu dê fêrî metodên çêkirinê û sazîkirinê bibî û zanyariyan li ser amûret, makîne, materyal û malzemeyan werbigirî. Ev pisporî îmkanê dide ku tu wek, bo nimûne, alîkarê berpirsiyarê kirîne, terzî/dirûnker yan di warê tekstîl û kincên hazir de kar bikî.

### Karên destan yên din

- Tu dê di warê xwe ya taybetî de fêrî metodên çêkirinê û teknîkan bibî û zanyariyan li ser amûret, materyal û malzemeyan werbigirî. Ev pisporî îmkanê dide ku tu wek, bo nimûne, şûsesaz, nalbend, zêrker yan zîvker, seramîkkar, zînker, paqijkerê pixêriyan, stîlistê por û makyajê, poşkarê mobîlye û dîwaran yan saetçî kar bikî.

**Tiştên ku tu dê di vê bernameyê de fêr bibî**

Di vê bernameyê de, tu dê zanyariyan li ser prosesa karê destan, formsazî, şirketkarî û xizmetê werbigirî. Tu dê fêr bibî ku hiziran bikî berhemên hazir û biryarê bidî ka pêwîstiya te dê bi kîjan materyal, malzeme û makîneyan hebe. Tu dê fêr jî bibî ka tu dê çawa hesaba qezenca aborî bikî.

**Bername weha hatiye rêxistin**

Madeyên dersê di bernameyên pişeyî de madeyên lîseyê yê hevbeş in: îngilîzî, dîrok, werziş û tenduristî, matematîk, zanist, zanyariyên dînî, zanyariyên civakê û zimanê swêdî yan swêdî wek zimanê duyê.

Di bernameyên pişeyî de, tu dê zêdetir madeyên pişeyî, yê ku jê re madeyên taybetmend tê gotin, û kêmtir madeyên ku te li dibistana bingehî xwendine bixwînî. Mitehîdî, karê destan û zanyariyên karê destan madeyên taybetmend yê hevbeş yê vê bernameyê ne.

Îmkan heye ku tu di bernameyê de xwe pisportir û zanatir bikî. Ji wê re bernamekûrkolîn (programfördjupning). Ji xwendingehê bipirse ka ew kîjan kursên kûrlêkolînê dide.

Hilbijartina ferdî jî heye ku tu dikarî wê ya ku tu dixwazî bixwînî hilbijêrî. Ji xwendingehê bipirse ka kîjan kurs hene.

**Awayên xebatê**

Tu dê di vê bernameyê de tiştê herî giring ji bo senaetkarekî, prosesa karê destan, pêşde bibî. Ev tê wê maneyê ku tu dê bikarî pêwîstiya mişteriyî nas bikî, karê xwe plan bikî, amûretan bi awayekê rast hilbijêrî û bi kar bînî, materyal, malzeme û teknîkên minasib bibijêrî, karê xwe tamam bikî û berçav bikî û encamê analîz bikî û binirxînî.

**Projeya lîseyê**

Tu dê di dawiya Bernameya karê destan de projeyeka lîseyê di warê karê destan yê ku te bijartiyê de amade bikî. Tu dê bi wê nîşan bidî ku zanyariyên pêdvî yê ji bo destpêkirina karê ku te ji bo xatirê wî xwendiyê li bal te hene.

**Fêrbûna li cihê karî**

Hin beşên xwendinê herî kêr 15 hefteyan li cihê yan çend cihên karî bi rê ve diçin û jê re arbetsplatsförlagd lärande (apl) – fêrbûna li cihê karî – tê gotin. Ev parçeyeka giring ya perwerdeyê ye. Apl tecrîbeyan û herweha kontaktan yê ku dikarin di dema lêgerîna karî de ji te re bisûd bin dide te.

**Şagirdikirin**

Heger xwendingeh di çarçoveya bernameyê de perwerdeya şagirdikirinê ya lîseyê pêşkêş bike, tu dikarî wê hilbijêrî. Maneya wê ew e ku tu dê heman zanyariyan werbigirî lê dê herî kêr nîva xwendina xwe li cihê yan çend cihên karî bikî.

**Balkişandin**

Giring e ku tu xwendina xwe plan bikî heger tu bixwazî şertên bingehî yê xwendina bilind bi dest bixî. Ji bo bidestxistina şertên bingehî yê xwendina bilind tu dikarî li gor dilê xwe di çarçoveya hilbijartina ferdî û bernamekûrkolînê de, heger xwendingeh wê pêşkêş bike, kursên pêdvî bixwînî. Ew du kursên zêdetir yê zimanê swêdî yan swêdî wek zimanê duyê û kurseka zimanê îngilîzî ne. Heger tu bixwazî hêjî bixwînî, li gel rêberekê xwendin û pişeyê biaxive.

Hergav mafê te heye ku tu di çarçoveya hilbijartina ferdî de kurseka din ya zêde di warê werziş û tenduristiyê de û kurseka huner